


## Çavkaniyên enerjiyê ên Seûdî û Îranê!

»»» R:7




## Daxuyaniya Navenda Siyasî a PDKÎ bi hilkefta 26`ê Xermananê

»»» R:3



## Rezbereke din

»»» R:2



Girtiyan tenê maf hebûn bêjin “emir bike “qûmûtanê min

»»» R:8



*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siyasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (358) 22-09-2019 Buha (1000) Tûmen

## Çiyayê Baweriyê


**Meha Xermananê ji me Kurdan re terajidiyeka neteweyî ye, mehek ku tê de çendîn karesatên dilêş pêsîra me girtin.**

Di roja 5-ê Xermanan sala 1358-an a Rojî (1979-an) de û hevdem digel biryara cîhada Xomêynî ê cellad 11 Kurd di dadgehîkirineke 5 deqeyî de bi mirinê hatin mehkûmkirin û di firokexaneya bajarê Sine de hatin gullebarankirin, ku bi “îdamên li firokexane”yê hatiye binavkirin. du kes ji wan 11 kesan ku di firokexaneyê de hatin gullebarankirin, birîndar bûn û kesek bi birankardê birin ber darê îdamê, û belavbûna wêneyên îdamên li bajarê Sine di belavokên navxwe û derve de, her wê demê nerazîbûna mezin ya civatên xelkê lê ket.

Çend rojan piştî 5-ê Xermananê û di roja 9-ê Xermanana sala 1358-an a Rojî (1979) de, Foad Mustefa Sultanî naskirî bi kak Foad yek ji avakerên Komleyê bi destên hêzên rejîma Tehranê di şerekî neberamber de hate şehîdkirin. Rola Kak Foad di dîroka tevgera Rojhilata Kurdistanê de diyar e. Tenê heşt mehan piştî rizgariya ji bendîxaneyê û heya dema şehîdbûnê di temenê 31 saliyê de û di vê heyama kêm de karî rûpeleke nû binexşîne.
Du roj bi ser şehîdkirina kak Foad re derbaz bibû ku di roja 11-ê Xermanana sala 1358-an a Rojî (1979) de ji aliyê hêzên rejîma Îranê ve wate ji aliyê Spaha Pasdaran a terorîstî ve, komkujiya Qarnê rû da, di vê komkujiyê de 68 Kurdên xelkê gundê Qarnê a ser bi bajarê Nexedê li Rojhilata Kurdistanê ku jin û zarok û pîr û îxtiyar bûn bi destên celladên rejîmê bêrehmane hatin kuştin û rûpeleke bixwîn di dîroka Kurd de hate hildan.

Herweha di roja 17-ê Xermanana 2718-an a Kurdî (2018) de, û dîsan Kurd kete ber êrîşa rejîma hov û mûşekên rejîmê çendîn şoreşgerên Kurd şehîd kirin. 17-ê Xermananê rojeke bixwîn bû ku hemû Kurdistan hejand.
Di vê roja bixwîn de sê lawên Kurd bi navên Ramîn Husên penahî û Zanyar Muradî, û Luqman Muradî ji aliyê rejîma komara sêdareyê ve hatin îdamkirin, û hevdem rejîmê binkeyên Hizba Demokrat li Koyê mûşekbaran kirin, û du mamosteyên fêrgeha PDKÎ bi navên Farûq Hesenxeyat û Muxtar Qadirpûr tevlî karwana şehîdên Kurdistanê bûn. Herweha di vê êrîşê de 14 kadr û pêşmergeyên “Hevalên Pêşîn” hatin şehîdkirin.

Di roja 26-ê Xermanana sala 1371-an a Rojî (1992) de karesata Mîkonosê rû da. Di vê karesatê de Dr. Sadiq Şerefkendî sekreterê giştî ê wê demê yê PDKÎ ji aliyê rejîma Îranê ve hate şehîdkirin. Dr. Şerefkendî piştî terorkirina Dr. Qasimlo bû sekreterê giştî ê PDKÎ. Di karesata Mîkonosê de her wekî Dr. Qasimlo bû qurbaniyê destê terorê. Dadgehekê li bajarê Birlînê de piştî lêkolîna bûyera Mîkonosê, şandiyên rejîma Îslamiya Îranê bo encamdana vê terorê tawanbar kirin. Elî Xamineyî rêberê rejîma Îslamiya Îranê û Ekber Haşimiyê Refsencanî serkomarê wê demê ê rejîmê û Elî Felahiyan Wezîrê Îtila`ata wê demê ya



rejîmê wekî bikerên sereke ên vê terorê hatin nasîn.
Bo yekem car di dadgeheke serbixwe û xwedî hitbar de rejîma Wilayeta Feqîhî dikeve pêşberî dadbîniyê û tawanên wan têne eşkerekirin, lewra bi heq ji aliyê hemû organan û hogirên dadperweriyê û mafê mirovan ve giringiyeke zaf bi vê hûrbîniyê hate dan, û hemû aliyekî encama wê meraq dikirin.

Dadgeha Mîkonosê ku di Birlîna Almanyayê de bi rê ve çû, zêdetir ji sê sal û nîvan dom kir û di vê heyamê de 247 caran civîn bi rê ve çûn. 166 heya 170 kesî jî bo şahidîdanê hatin gazîkirin. Li gora çavkaniyekê xercê vê dadgehê li derdora 9 milyon Markê Almanî bû.
Her çend ku biryara dadgehê jî nekarî jan û êşa jidestdana Dr. Şerefkendî ji me re kêm bike, lê cihê serfiraziyê ye bo me ku rêberên me hekî cendekê laşê wan jî ji nav herin, lê her sembol û rênîşander in, û leşê bêcan ê wan dibe sedema eşkerebûna zêdetir ya cewhera rastîn a Komara Axûndî.

## Sergotar

### Rezbereke din

N: Kerîm Perwîzî

Zimanê te, kêrnehatî ye, û dê û bavê te gellek paşvemayî ne, û mêjiyê wan pûç bûye, û nekarîne û hez nekirine ku te fêrî zimanekî şîrîn û îroyîn bikin, û dibe ku tu bi zimanê şîrîn ê Farsî qise bikî, lewra tu mirovekî tewaw ninî, û ji zarokên pile sê û çar î, ku dibe li ser te kar bê kirin, da ku hêdî-hêdî li mirovan nêzîk bibî.

Eva peyama rohn û eşkere ya pirojeya rejîma koloniyalîstî ya faşîst a Tehranê ye, ku di bin navê hînkirina zarokan de bi zimanê Farsî, dixwaze ku kuştargeha ferheng û kultur û zimanî rê bixe. Li gora vê pirojeyê, zarokên neteweyên xeyrî Fars ku wekî mirovên netewaw li wan tê nihêrîn, berî sala xwendina xwendingehê, taqîkariyeke zimanê farsî li ser encam didin, û hekî farsiya wan gellek kirêt nebû, wê demê wê wan bibin binkeya berî xwendingehê, da ku taliya zimanê dayîkê ji wan dûr bixin, û hingivîna farsî berdin devê wan de.

Xwendingeh ji serdema Yonana kevn ve, her ji xwendingeha Soqrat ve bigre heya niha, cihek bûye da ku zanist û zanayiyê fêrî mirovan bike. Sîstema perwerdeya cîhana azad ku mirov tê de nirx heye, bona vegeşîna mirovan û bona baranîna nivşa bê ye, da ku jiyan li cem civakê hişk û dogm nebe, û geşeyê bike. Lê di sîstema kolonyalîstî, ya Wilayeta Feqîh de ku di hizra şovenîstî de, dirêjkiriya fikra Rezaxanê Mîrpenc e, xwendingeh wekî qesabxaneyê çav lê tê kirin.

Ew sîstema faşîstî destpêka sala xwendinê dike destpêka demsala zîndan û îşkence û kuştarê. Zarokek ku çend salan di nava malbata xwe de bi zimanê Kurdî ya Erebî ya Belûçî ya Tirkiya Azerî û yan jî Turkemenî fêr bûye, û guh û mêjiyê wê bi vî zimanî edet kiriye, dibin cihekî ku ji nişkêva dibêjnê ku dibe zimanê te bê birîn, û dengeke neşaz di guhên wê de tê xwendin.

Rezber û destpêka Payîzê ku destpêka sala xwendinê ye di Îranê de, dibe bo zarokan demsala herî şîrîn û roja herî xweş be, da ku bi ew qasê xweşî û hezkirin ve ber bi xwendingehê ve herin, û jiber ku xwendingeh binkeyeke dûr ji malbatê ye, û ji naz û hezkirina malbatê dûr dikeve, û dibe xwendingeh vê nazkirin û pêregihîştinê jê re cubran bike, da ku baştir waneyên xwe werbigre, lê di Îrana di bin deshilata bîra faşîstî de, xwendingeh wekî girtîgehê ne; û ji vê jî xirabtir her dixwazin bi tewahî bikin qesabxane.

Eva kuştareke bikom a ferhengî ye, ku ne tenê ziman û nasnameyê dihelîne, belku bi vê reftarê dixwaze zarokên neteweyên bindest jî bêzar bin ji piroseya xwendinê, û di warê xwendewariya nivşên bê de jî, paşve bimînin, û di rastî de sîstema xwendinê di Îranê de bûye regezperestiyeke rût û hovane.

## Bo bilindnirxandina yad û bîra şehîdên Mîkonosê, semînarek hate lidarxistin




**Li binkeya sereke ya Partiya Demokrat, bi hilkefta 27`emîn salvegera terora "Dr. Sadiq Şerefkendî" û hevalên wî, semînarek hate lidarxistin.**

Roja Duşemî 25`ê Xermanan, li binkeya sereke ya Partiya Demokrat, bo rêzgirtin li bîr û yada şehîdên Mîkonosê, semînareke taybet bo "Dr. Mîro Elyar" Cihgirê Berpisê Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat hate pêkanîn.

Rêûresim bi xwandina marşa netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.

Piştre jiyanameya rêberê şehîd, "Dr. Sadiq Şerefkendî" û hevalên wî hate pêşkêşkirin.

Paşê "Dr. Mîro Elyar", di para yekim ya axavtinê xwe de, bi awayekî kurt awaya bûyera terora Mîkonos û meşa dadgehê bo li pey ketina wî bûyerê bo amadebûyan bas kir ku, çawa komara Îslamî hate tawanbarkirin.

Navbirî sedema sereke ya tawanbarkirina rejîma Îran û li pey ketina dadgeha Mîkonos bo wî keysê bo gefa terorîzma rejîmê bo ser hakimiyeta Ewropayê û gefên berdewam bo kuştina dadsitanê Mîkonosê bas kir. Di vê derheqê de axavtinê yekik li parêzerên keysa Mîkonosê anî ber bas ku gotibû: "berî dadgeha Mîkonosê, Ewropa bibû bi cih û warê bê yasa û rêsa û lêpirsîn bo terorîstên komara Îslamî bi merema kuştina çalakvanên opozisiyona xwe".

"Dr. Mîro" di pareke din ya axavtinê xwe de îşare bi rola dadgeha Mîkonos li kurdtkirina destê terora rejîma Îranê li Ewropayê kir ku, bi sedema biryarara dadgehê ve heya çend sal beriya niha rejîma îslamî ya Îranê nekariye ti kiryareke terorîstî di nav axa Evropayê de encam bide.

Navbirî di dawiya axavtinê xwe de basa sedema bi sembolbûna Dr. Sadiq Şerefkendî kir û ragihand: "Di dîroka hereketa Kurd de, gelek caran hatiye dîtin ku rejîm ji bo jinavbirina hereketan cexta jinavbirrina rêberan daye ca çi bi kuştin be yan bi curek din be, û piştî nemana rêber, şoreş rastî aşbetaliyê hatiye. Lê Dr. Şerefkendî şanaziya dawîanîn bi wê diyardeya cergbir ya hereketa Kurdî bi navê xwe ve tomar kir".

# Daxuyaniya Navenda Siyasî a PDKÎ bi hilkefta 26`ê Xermananê

**Navenda Siyasî a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, bi hilkefta 27`emîn salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî daxuyaniyek belav kir.**

Daxuyanî wiha ye:

Daxuyaniya Navenda Siyasî a PDKÎ bi hilkefta 27`emîn salvegera terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî

Hevnîştimaniyên birêz!

27 sal bi ser terora 17`ê Îlona 1992`an (26`ê Xermanana 1371`an) re derbas dibe, rojek ku Dr. Sadiq Şerefkendî Sekreterê Giştî yê ev demê yê PDKÎ û hevalên wî "Fetah Ebdulî", nûnerê Hizbê li dervey welat, "Homayon Erdelan", nûnerê Hizbê li Alman û "Nûrî Dêhkurdî", çalakê naskirî yê Opozisiyon, li Birlîna Almanê rastî telika tîmeke terorên Komara Îslamî hatin û şehîd bûn.

Dr. Şerfkendî û hevalên wî ku piştî amadebûna li kongirerya Enternasiyonala Sosyalîst, bo hevdîtin û guherîna bîr û boçûnan digel hejmarek ji çalakên opozîsyona Îranê, li restorana "Mîkopnos" civiyan, û di vir de rastî êrîşa terorîstên Komara Îslamî hatin.

Dadgeha Berlîn ku bi dadgeha "Mîkonos" hatiye naskirin, li rêketa 10`ê Nîsana 1997`an (21`ê Xakelêweya 1376`an), hukma xwe derheq terorkirina Dr. Şerfkendî û hevalên wî ragihand.

Di vê hikmê de, dadgehê bi eşkere rêberên Komara Îslamî di astên herî bilind de, (Elî Xamineyî, rêberê rejîmê, Haşimî Refsencanî serkomarê wê demê yê rejîma Îranê û wezîrên derve ên îtila`ata Spaha Pasdaranên nizama Îslamî), bi pilandarêj û lidarxistina wê terora tirajîdî dane naskirin û ew terorîst bi hepsê mehkûm kirin.

Eşkerekirina terorîzma dewletî ya Komara Îslamî di dageheke serbixwe a welateke demokratîk de, bû sedema riswabûna rejîma Îranê, wekî hikûmetekê ku bi eşkerer teror û terorîzm wekî emrazek bo gihîştin bi armancên xwe mifah jê werdigirt.

Komara Îslamî bi du sedemên sereke Dr. Sadiq Şerefkendî teror kirin:

Yekem, Komara Îslamî ji destpêka avabûna xwe ve, bi giştî kuştin û bêserûşûnkirin û terorkirina kesayetî û rêberên opozisiyonê kire siyaseta fermî ya xwe, û di wê heyamê de, hejmareke zêde ji endamên opozisyonê bûne qurbaniyên terorîzma dewletî a wê rejîmê.


Duyem sedema sereke a vê cinayetê, nemaze dizavire bo rola yekalîker a Dr. Şerefkendî piştî terora Dr. Ebdulrehman Qasimlo li Vîyena Utrîşê, li 13`ê Tîrmeha 1989-an a Zayînî bi destê terorîstên Komara Îslamî.

Rejîma Komara Îslamê bi vê hêviyê Dr. Qasimlo teror kirin ku piştî wî xelkê Kurdistanê jî bêhêvî dibe, û tevgera netewa Kurd li Kurdistana Îranê, rastî şikestê tê, û bi dawî dibe!

Lê ev xevna rejîma Îranê nehate cî! Piştî kareseta Viyenê, rêberiya Hizba Demokrat kete destê "Dr. Sadiq Şerefkendî" ê xwedîşiyan û xebatkar û bi hemû şiyana xwe û bi lêhatîbûna xwe, nehêla alaya xebata rizgarîxwazî a Hizbê bikeve erdê. "Dr. Şerefkendî" bi jêhatîbûna bêmînak û bi hevkariya hevalên xwe, siyaset û rêbaza Dr. Qasimlo li navxwe û dervey Hizbê domand, û bi vî awayî dijmin xeyîdand.

Eva bû ku rejîma Îslamî kete darêtina pilanan bo terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî.

Rejîma dîktator a Komara Îslamî nedizanî mezinî û jêhatîbûbna Dr. Qasimlo di vê de bû ku ji bilî zanatî û xwedîşiyaniya xwe, Hizbeke



Demokrat û xebatkar li pey xwe bi cih hêla, ku bi qewlê xwe "Eger parek ji rêberiya Hizbê jî şehîd be, Hizb li ser piyên xwe dimîne û xebatê didomîne".

Bûyerên ku Dr. Qasimlo bi dirustî pêşbînî kiribûn ser girtin.

Bêşik, bi şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî, derbeyeke mezin li Hizba demokrat û hereketa rizgarîxwaziyê ket, lê Komara Îslamî negihîşte hêviyên xwe. Hizba Demokrat li pey terora "Mîkonos"ê jî, rastî nisko û bêhêviyê nebû, û dest ji xebatê berneda.

Îro rojê em dibînin ku alaya xebata Hizba "Sadiq Şerefkendî" pêlan dide, û kadr û pêşmerge û endam û alîgirên Hizbê li pêxema bidestveanîna armancên bilind ên "Qasimlo û Şerfkendî" bi bê tu dudiliyekê, bi bawereke qahîm û bi moraleke bilind xebata xwe didomînin.

Îsal em di demekê de şehîdên Birlînê bi bîr tînin, û rêz ji xebat û cangorîtiya wan digrin ku Komara Îslamî, di encama domandina siyasetên serkut û binpêkirina mafên azadîxwaziyê ên gelên Îranê di navxweyî welat de, herwisa berdewamkirina siyasetên tevdanîkariyê û berfirehkirin terorîzm û destêwerdana di nava karûbarên navxweyî ê welatên deverê de, Îran rastî komek arîşeyên siyasî, aborî û civakî ên wisa mezin hatiye, ku di van 40 salên derbasbûyî de bêmînak bûye.

Giraniyeke heyrîmayî a rojbiroj, betalî, hejarî, dîktatorî û serkut, dizî û gendeliya bêsînor a sîstematîk a hikûmetê, belavkirina madeyên hişber û …hwd bûne sedema nerizayetiya berfireh a hemû xelk û tex û qatên cuda, ji desthelata hakim, û civaka Îranê gihandiye sînorê teqandinê.

Rejîm bo çareserkirina tu yek ji wan pirsgirêkan bernameyeke bicî tuneye, û bo tu yek li daxwazên rewa ên xelkê ji bilî serkut û binçavkirin û kuştinê, bersivek bo xelkê nîne.

Rejîmê ew hemû qeyran û rewşek weha xistiye stûyê "dijminên derve" û cezayên aborî ku di rastî de sedema sepandina dorpêçên navdewletî bo ser siyaset û kiryarên wê ne, beramber bi civaka cîhanî dide zanîn.

Di derheqê neteweyên bindest de, ne tenê tu guherîneke erênî bi qazancê wan li siyasetên rejîmê de cîbicî nake, berevajî, Komara Îslamî tundûtîjtir ji berê mafên siyasî û kultûrî binpê dike, û her rojekê bi hêceteke siyasî, neteweyên xeyrî Fars asimîle dike.

Wekî dawî pêngavên rejîm li dijî gelên jêrdest ên Îranê, dibe îşare bi "Terha Besendigî a zimanê Farsî" û qedexekirina kincên Kurdî û îcbarîkirina kincên fermî bo zarokên Kurd û neteweyên bindest ên din bê kirin.

Hevnîştimaniyên birêz!

»»» Dom R:4

»»» Doma R:4

Rejîm bi jidestdana rewayiya xwe, bawerî bi xwe nemaye, û ji siya xwe ditirse, û li piştasayîtirîn hereket û daxwazên herî biçûk ên pîşeyî yên hevwelatiyan, pîlanên xwe dest pê dike, û hawara xwe dibe ber tundûtîjî û serkutê: Rejîm bi berdewamî kolberên Kurd dikuje û ti rêyek bo wê ku xwe xwedî bikin nehêlaye, û çalakên jîngehparêzî, jinên xwazyarê dadê û li dijî apartayda zayendî, mamostayên dibistanan û kedkarên ku daxwaza wan heqdestê wan ê paşketî bû, û…hwd, û hemû çalakî û daxwazên ku pêwendiyek bi siyasetê ve nîne, ji aliyê rejîma tirsinok û paşmayî ve bi sîxorîkirin bo welatên bîhanî têne tawanbarkirin, û piştre têne desteserkirin û dikevin girtîgehan de.

Di hember de, xelk roj li pey rejê tirsa wan ji rejîmê namîne, û girtin û bendîxane û eşkence bûye jiyana rojane ya wan. Îro nûçeya hepskirina wajokerên nameyeke servekirî bo Elî Xamineyî belav dibe, sibê girûpek din a jin û mêran, nameyeke servekirî dinivîsin û daxwaza dest ji kar kişandina Xamineyî û guherîna yasaya bingehîn a Îranê dikin. Ew hereketa her berdewam e!

Em wekî PDKÎ piştevaniya xwe ji tev tex û qatên ku daxwaza maf û azadiya xwe dikin û dijî dîktatorî ya Komara Îslamî disekînin, nîşan didin.

Hevnîştimaniyên birêz!

"Dr. Şerfkendî" di demekê de hate şehîdkirin ku digel çend kasayetiyên opozisyon ên Îranî li derheq pirsa havkarî û yekgirtinê mijûlî guherîna bîr û nerînan bû.

Ew pêdawiye îro jî piştî 27 sal bi zêdeyî ve her li cihê xwe ye û berbelav e, û nebûna opozisyoneke demokratîk û yekgirtî bi xala bihêz a Komara Îslamî û sedemeke sereke ya mana rejîmê û bi xala lawaz a azadîxwazên Îranî li hember bi zordarî ya mezhebî a Komara Îslamî didanê.

Tenê rêya rizgarbûn ji destê hakimiyeta teror û serdestiya Komara Îslamî, domandin û berfirehkirina xebatê ye, di asta Kurdistan û Îranê de, û bi hemû awayekî bicih, û bi awayekî yekgirtî.

Silav li canê paqij ê şehîd "Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî Fetah Ebdulî û Homayon Erdelan û Nûrî Dêhkurî û tev şehîdên rêya rizgariya Kurdistanê. Berdewam be xebata rewa ya gelê me bo aştî û azadiyê Berdewam be xebata Hizba me li pêxema bidestveanîna mafên netewayetî yên gelê me

Partiya Demokrat a Kurtdistana Îranê

Navenda Siyasî

25`ê Xermanan 1398`an (16`ê Îlona 2019`an)

# Pêşmergên dewra nû axabanûya şehîdan li stuyê xwe alandin

**Komek din li ciwanên tekoşer ên kurdistanê, piştî dawîhatina dewreya destpêkî a pêşmergayetî, tevlî refên pêşmergê Kurdistanê bûn.**

Nûçegihanê "Kurdistanmedia"yê, li çiyayên Kurdistanê ragihand ku, roja Pêncşemî 21`ê Xermanan, rêûresma dawîhatina dewreya 238 a destpêkî ya pêşmerge hate lidarxistin.

Rêûresim bi xwandina marşa netewî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîstekê bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.

Piştre bi vê boneyê, peyema Fermandê Hêza Pêşmergê Kurdistan, ji aliyê "Es`ed Ehmedî", endamê Hêza Pêşmergê Kurdistanê ve hate pêşkêşkirin ku, di pareke peyama wî de, rû li amadebûyên dewrê ragihand: "Hêvîdarim li rastaya ber bi pêşveçûna erkên pêşmerge de serkevtî bin û waneyên fêrgeh bikin bi bar bo rê û tekoşîna xwe û di paşerojê de bo Hizb û gelê me destkevtên baş li pey xwe hebe".

Navbirî di pareke din a axavtinê xwe de tevî îşare bi rewşa deverê û ew alugor û hemû ew givaşên ku li ser rejîma Îranê hatiye afirandin, behsa vê kir ku hebûna ew hemû givaşên derve, raste dibe sedema lawaz kirina rejîma Îranê, lê hêza rastî bo jinavbirina rejîma Îranê, nerizayetiya navxweyî a gelên Îranê ye ku, bêşik yekdengiya hêz û Hizbên Kurdî bandoreke rasterast li ser wan hedibe. Mînaka herî berçav a vê yekê, girev girtina sala derbasbûyî a xelkê Kurdistanê ku bi handana banghêjiya Navenda Havkariyê ya Partiyên Kurdistana Îranê ve hatin û bi yekdengî û bi hev re, dikan û bazarên xwe daxistin.

Piştî axavtinê "Es`ed Ehmedî" helbestek bi navê "Welat" ji aliyê amadebûneke dewre ve hate pêşkêşkirin.

Piştre "Şaho Xefûrî", rapora Perwerdeya Fêrgeh ya Fermandehiya Hêza Pêşmergê Kurdistanê xwind.

Piştre sirûdek bi navê "Bo Pêşmerge" ji aliyê amadebûyek derwe ve hate pêşkêşkirin.

Li pareke din a rêûresmê de



peyama dewreyê hate xwindin.

Piştre stranek bi navê "Weten" ji aliyê amadebûyeke dewre ve hate pêşkêşkirin.

Di beşeke din a vê rêûresmê de, xelat bi ser kesên serkevtî di vê dewreyê de hate parvekirin.

Piştre amadebûyekî din ê dewre stranek bi navê "Bo Kurdistan" pêşkêş kir.

Her di vê rêûresmê de, "Mariya Qurbanî", hevjîna şehîd "Luqman Şêxanî", axabanûya hevjîna xwe yê şehîd pêşkêşê Fêrgeha Fermandehiya Hêza Pêşmergê Kurdistanê kir, û ew axabanûye ji aliyê "Muxtar Suhrabî" berpirsê Fêrgeha Fermandehiya Hêza Pêşmergê Kurdistan ve hate vergirtin û digel vergirtina axabanûya hevalê şehîd "Luqman Şêxanî" de peymana emegnasî bi rêbaza şehîdên Kurdistanê nû kir.

Piştre straneke şoreşvanî ji aliyê amadebûyekî dewrê ve hate pêşkêşkirin.

Ev rêûresme bi encamdana çend nimayişeke leşkerî, ji aliyê amadebûyên dewrê ve dawî pê hat.

## Bi boneya yekemîn salvegera cinayeta 17`ê Xermanan, semînarek hate lidarxistin

**Bi boneya yekemîn salvegera mûşekbarana binkeyên PDKÎ û îdam kirina sê hepsiyên siyasî yên Kurd ji aliyê rejîma Îranê ve, semînarek hate lidrxistin.**

Roja Yekşemî 17`ê Xermanan li kempa Cêjnîkanê, semînarek taybet bi cinayeta 17`ê Xermanan ku rûpeleke reş a din li cinayetên rejîma Îranê bû, bi amadebûna hejmarek li endamên rêberî, kadir, pêşmerge û malbatên Demokrat bi rê ve çû.

Rêûresim bi xwandina marşa neteŵî a "Ey Reqîb" û ragirtina bîsteke bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurd û Kurdistanê dest pê kir.
Piştre "kerîm Perwîzî" endamê Desteya Kargerî a Partiya Demokrat û "Hîsam Destpîş" nûnerê Partiya Demokrat li Yekîtiya Ewropayê, li ser cinayet û tawana 17`ê Xermanan di du parên cuda de li derheq bi wan cinayetan axavtinên xwe pêşkêş kirin.

Destpêkê "Kerîm Perwîzî" îşare bi merema rejîma dirinde ya komara Îslamî a Îranê bo encam dana wê tawanê kir û got: "Rejîm ji aliyekê xwast hêzên nabermberî ên leşkerî ên xwe û agir û hesin nîşan bide û hêzên dijberî xwe û nemaze Hizba Demokrat çav tirsî bike, û



ji aliyekî din ve jî, ji warê siyasî ve gelê Kurd çavtirsî bike û îradeya pola a wan bi çok bîne. Rejîm ku li hember amadebûna pêşmerge di nav axa Rojhilatê Kurdistanê de detst girêdayî mabû, merema wî eve bû ku morala têkçûya hêzên xwe bibe serê".

"Kerîm Perwîzî" behsa berteknîşandana xelkê nîştimanperwer ên Rojhilatê Kurdistanê kir ku, bi yekdengî û yekgirtî bi merema piştevanî li hêzên şoreşvan û bo şermezarkirina ew cinayeta komara Îslamî a Îranê, gireva sertaserî lidar xisrin, û komara Îslamî bi çok anîn û nîşan dan ku di hember mûşekbaran û îdamkirina xortên xwe de, bê bertek nînin û digel wan ji yek cuda nekirine.

Li para du a vê semînarê de, "Hîsam Destpîş" behsek pêşkêş kir û got ku: "Komara Îslamî a Îranê di çi jîngeh û rewşekî wiha de cinayet encam nedabû, herwisa em di çi rewşekê de bûn, bo mînak rejîm di navxweyê welat xwe bi şikestxwarî dida zanîn, ji aliyek din ve jî di jêr givaşên navdewletî de bû. Kurd û nemaze Hizba Demokrat jî ,di meydana xebat de bi îradeyeke bihêz ve li serê bûn, nemaze xebata nû a Rojhilatê (RASAN) di gûpikê bû, Rasanê bandoreke baş li ser hişyariya xelkê û xebata xelkê danî, hekî Rasan neba, Newroza axabano jî nedibû, hemasa alîkarîkirin bi zirarberketiyên Kirmaşanê jî nedibû, yekîtî û yekdengiya 21`ê Xermanan jî nedibû, hekî me jî kar nekiriba xelkê jî bersiv nedida".

"Hîsam Destpîş" di berdewamiya axavtinê xwe de got: "Bêguman her hereketeke pêşmerge dikare, hereketeke xelkê bi rê bixe, ji bo vê jî rejîm di navxwe de rewabûn wî nema ye, bi hewce zanî ku bi wê mebestê, wê cinayetê encam bidin. Bi derbe lêdan li hêza dijberê xwe rewabûnê bi dest bîne, welatên deverê çavtirsî bike û hêza xwe nîşan bide. Lê ji bo komara Îslamî çi li pey xwe hebû? Gelê Kurd yekgirtî kir. Naveroka çewtekariyên rejîmê bo xelkê Başûrê Kurdistanê derket û heta welatên Erebî jî xwe nêzîkê Îsra`îlê kirin. Hêza gelê Kurd û îradeya rizgarîxwazaneya Kurd bi dijberê rejîm dizanin derket û ceriband".

Ew semînare bi pirsyarên amadebûyan û bersivdana wan ji aliyê pêşkêşkaran ve dawî pê hat.

## Yekîtiya Zanayên Olî ên Kurdistanê peyama hevderdiyê belav kir

**Yekîtiya Zanayên olî ên Kurdistanê li salvegera terorkirina rêberê şehîd, "Dr. Şerefkendî û hevalên wî" peyama hevderdiyê belab kir.**

Di wê peyama hevderdî de hatiyiye: 26`ê Xermanan salvegera terora rêberê netewa me û Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, di vê rojê de, tarîperestên nezan, xwîna rêberê hertim zîndî ê netewa Kurd bi neheqî rijandin û carek din rûyê reş ê xwe bo hemû cîhanê derxist ku, çende dirinde ye û hêviya wan ji navbirina neteweyeke zilim lê hatî kirin ne!



Di dawiyê de hatiye: Yekîtiya Zanayên Olî ên Kurdistana Îranê bi wê hilkeftê, hevderdiya xwe digel PDKÎ û xelkê Rojhilatê ducar dike û dane zanîn: Em hêvîdarin Rasaniyên şoreşvan micidtir li caran bo bidestanîn armancên rêberên şehîd di vê pêxemê de berdewam bin.

Riha şehîd Dr. Şerefkendî û hemû şehîdên Kurdistanê Şad be

Yekîtiya Zanayên Olî ên Kurdistana Rojhilata Îranê

23`ê Xermanan 1398 a rojî

# Semînarek di derbarê terora Mîkonosê û pêgeha Dr. Sadiq Şerefkendî de hate pêkanîn

**Komîteya rêveber a Krêwresmên Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi helkeftina 27emîn salvegera terora Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî semînarek li kempa Cêjnîkanê pêk anî.**

Semînar roja îniyê 29ê Xermananê ji bo Hesen Şerefî cîgirê yekem ê lêpirsyarê giştî ê PDKÎ û berpirsê navenda siyasî a vê partiyê hate pêkanîn û tê de hin endamên navenda siyasî û desteya kargiriyê a PDKÎ, kadir û pêşmerge û endamên rêkxistina eşkere a vê partiyê ên Hewlêr û Cêjnîkanê beşdar bûn.

Semînar bi marşa netewî a Ey Reqîb û bi xulekek bê dengiyê ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdên Kurdistanê hate destpêkirin.

Pişt re Hesen Şerefî bal kişande ser qonaxên jiyana zanistî û siyasî a rêberê şehîd Dr. Şerefkendî û got ku Dr. Sadiq weke rêber û hevalê bi wefa ê Dr. Qasimlo di tevgera Kurdî de li Kurdistana Rojhilat û bi taybetî jî di pêkhateya PDKÎ de xwediyê bandoreke pir mezin bû. Wî karî weke xwendekarekî emegnas û kesatiyeke jêhatî û lêzan, rê nede ku nemana Dr. Qasimlo bi cendekê PDKÎ ve xuya be û bi pêgeh û bandora xwe, xewna rejîmê a nemana vê partiyê têk bir.

Cîgirê yekem ê lêpirsyarê giştî ê PDKÎ daxuyand şehîdbûna Dr. Sadiqê zana, ziyaneke mezin ji bo cendekê PDKÎ û tevgera Kurdî li Kurdistana Rojhilat li pey xwe ve anî. Lê waneyên ku me ji rêberên mezin Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî girtin, ji bo me bûne çand û bingeha rêberiya bi kom. Heman wane jî bûne sedem ku tevî dehan pîlanên dujminan, hê jî PDKÎ pêgeha xwe weke berê parastiye û xweştiviya civakê û hêviya azadîxwazan e. Çavkaniya vê jî baweriya vê partiyê û siyasetên sereke ên vê û qehremaniya pêşmergeyan e.




Şerefî di beşeke din ji gotara xwe de behsa taybetmendiyên Dr. Seîd kir. Wî, ew weke nîşana berxwedan, wêrekî, exlaq û pirensîpê binav kir û got ku baweriyeke wî a kûr bi xebata hevgirtî û hevkariya di navbera hêz û aliyên siyasî ên Kurdî û Îranî de hebû. Bandora Dr. Sadiq di nav tevgera Kurdistana Rojhilat û opozîsyona Îranî de bû sedem ku dujminê gelê me ku heman Komara Îslamî a Îranê ye, bikeve hizra danîna pilana terora wî û jinavbirina fîzîkî a wê. Ji ber ku li gor eqla siyasî a Îranê, eger wan li serkirdeyê PDKÎ bixista, cendek û cesteyê vê partiyê jî dihate jinavbirin. Lê wan nezanîbû vî cendekî ava wan hizran vexwariye ku tevî birîndarbûnê, dîsa jî bejna xwe natewîne.

Berpirsê navenda siyasî a PDKÎ amaje kire ser terora Mîkonosê û ragihand tevî ku Komara Îslamî di riyên cuda de hewl dida Dadgeha Federal a Almanya ji rêya xwe derkeve û şaş be û rejîm weke terorên din bikare rizgar bibe, lê bi bêalîbûna dadgehê û rijdbûna PDKÎ, dadwer û polîs karîbûn biryara xwe a dawiyê bistînin û ragihandin ku tawanbarê sereke Komara Îslamî a Îranê ye û li pey re riswabûna vê rejîmê di asta navxwe, dîplomasî û navedewletî de jî çê bû.

Navbirî behsa xebata PDKÎ di qonaxên cuda de û rijdbûna wê li ser qonaxa Rasana Rojhilat kir û got ku em careke din tekezê dikin Rasan wê bi tevehiya aliyên xwe ve berdewam bike û wê bi piştevaniya civata xelkê, qehremaniya pêşmerge û endamên PDKÎ, gavên me di vê qonaxa hestyar de cidiîtir û xurttir bin û emê di xebatê de berdewam bin.

Hesen Şerefî di dawiyê de amaje kire ser rewşa niha û siyaseta tevlîhev a rejîma Komara Îslamî a Îranê li navxwe, navçe û cîhanê û got ku êdî rejîm ji her carê zêdetir goşegir bûye û kiryar û zêdexwaziyên wê li navçeyê, zêdetir bûne sedema goşegirbûna wê. Rewşa tevlîhev a aborî û dûrketina dost û hevpeymanên rejîmê li wan, bûne sedem ku pêgeha rejîmê lawaztir bibe û di hember de rewşa Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê weke partiyeke azadîxwaz, bi mişûr û berpirsyar gelek baş e. Herwisa baweriya me bi hêza xwe heye ku xelk e û baweriya me bi jêhatîbûn û cangorîtiya pêşmerge û endamên dilsoz ên tevgera me jî heye.

## Nerîna Lîderan




**Donald Trump:**

**“Ez dikarim destûrê bidim ku di xulekê de êrêşî ser 15 cihan di Îranê de bikin”.**



**Melik Selman:**
**“Êrîşa ser Aramkoyê kiyareke cinay-etkararne bû”.**



**Shi Jinping:**

**“Êrîşa ser çavkaniyên vizeya neftî ya Erebistanê bandor li ser bazara navneteweyî û deverê danîye”.**



**“Elî Xamineyî”:**

**“Danûstandina digel Amerîkayê nabe hebe”.**

## Çavkaniyên enerjiyê ên Seûdî û Îranê!



**N: Eskender Ce`iferî**



Îran yek ji welatên pir kangeh e û di warên wize û çavkaniyên enerjiyê de pir dewlemend e. Ji sala 1913an ve heya niha hertim weke duyemîn henardekara sereke a petrolê tê binavkirin. Hem li Kendavê û hem jî li derya Xezer, çavkaniyên enerjiyê hene ku bala civaka navdewletî jî bixwe ve dikşîne.

Îran dibêje Xezer a me ye lê belê li kêleka wan di Xezerê de, 50 kompaniyên Amerîkî û Berîtanî û herwisa 10 kompaniyên Rûsî jî mijûlî berhemanîn û henardekirina gaz û çavkaniyên din ên wizeyê ne. Îran li hebûna kompaniyên Amerîkî û Berîtanî li wir mikur nayê û dibêje em duyemîn welatê berhemhîner ê petrol û gazê li Xezerê ne. Herwisa tekezê dike ku ew dikare bi awayekî serbixwe, wan berheman henarde jî bike.

Îranê sala 2005an nêzîkî 4 milyon bermîlên petrolê berhem dianîn. Lê pişt re, êdî ev hejmar careke din negihaye vê astê. Sala 1974an zêdetirîn asta berhemanîna petrolê li Îranê hate tomarkirin ku nêzîkî 6 milyon bermîlan bû. Lê belê piştî guhertina rejîmê û bi derketina siyaseta kêmkirina asta berhemanîn û rakirina petrolê û herwisa bi destpêka şerê di navbera Îran û Îraqê de, ew rêje careke din daket. Ji aliyekî din ve tê gotin ku Îranê teknolojiya pêwîst ji bo rakirina petrolê nîn e û lewma jî nikare rêjeya rakirina petrol û gazê bilind bike. Dorpêçan di vê mijarê de jî bandora xwe nîşan dane û rê nadin teknolojiya pêwîst bigihe Îranê. Êdî ji sala 2005an ve heya niha hejmareke kin a bîrên petrolê li vî welatî hatine kolandin.

Dîsa jî nayê veşartin ku Îran nêzîkî 10 ji sedî petrola cîhanê lixwe digire. Ji xeynî ew kangehên cuda ên wize û enerjiyê ku li başûrê Îranê û li Kendavê hene, hin çavkaniyên din jî li bakurê Îranê hene. 15 ji sedî gaza cîhanê jî li Îranê tê berhemanîn ku para herî zêde a wê ji bo malan tê bikaranîn. Tevî vê Îran tenê di salekê de zêdetirî 4 milyard Dolaran sûtemeniyan hawirde dike û sedema sereke a wê jî kêmiya parzîngehan, qaçaxkirina petrolê û kêmiya asta bikaranînê di malan de ye. Xelkê Îranê gelek kêm gazê bi kar tîne û sedem jî rakirina alîkariyên dewletê di vî warî de ye ku weke yarane têne binavkirin.

Gotinên berpirsên cuda jî, carna gotegotan li pey xwe ve tînin û tê gotin ku Îran amara rastîn a rakirin û berhemanînê eşkere nake. Weliyolla Nanwakinarî nûnerê Babolserê di Meclîsa Îslamî a rejîmê de dibêje tevî ku ti astengiyên yasayî ji bo rakirin û berhemanînê li Xezerê li pêşberî wan nîn in, lê belê ji ber ku kûrahiya ava Xezerê li navçeyên di bin sînorê avî ê wan de zêde dibe, ew nikarin li wêderê berhemanînê bikin.

Tevî ku beriya niha hin amarên berhemanînê li wir hatibûn belavkirin, wezîrê derve ê rejîmê dibêje ew nikarin bixwe gazê li wir rakin û lewma jî navçeyê kirê didin.

Îran û Seûdî, du hêzên hevrik ên navçeyê ne ku her du welatên navbirî jî rêjeyeke zêde a enerjiyê ji bo cîhanê dabîn dikin yan jî dikarin dabîn bikin.

Di demên dawiyê de êrîşî ser parzîngeha Aramko a Seûdiyê hate kirin û tê gotin ku Îran encamdera êrîşê bûye. Ev çend sal in ku Seûdiyê pilan kiriye heya sala 2030an girêdayîbûna xwe bi petrolê bigihîne asta herî kêm û ew pilan jî weke Asoya 2030an hatiye binavkirin. Piroje di meha 4ê a sala 2016an de ji aliyê şazade Mihemed Bin Selman ve hate ragihandin û li gor wê, aboriya Seûdiyê wê zêdetirî petrolê, girêdayî warên torîstî û bilindkirina asta bazirganiyê a ji xeynî petrolê be. Herwisa wê Seûdî girîngiyeke zêdetir bide bûdceya çekdariyê, perwerde û bingehdanînê. Ew Piroje 80 pilanan li xwe digire ku ji bo her yek ji wan wê ji 3.7 heya 20 milyard Dolaran bê mezaxtin.

Piştî vê êrîşa ser Aramkoyê, demlidest asta henardekirina petrolê û nirxên wê hatin guhertin. Petrol, ji girîngtirîn pîşeyên Seûdiyê ye ku dibe sedema pêşketina vî welatî. Wek tê gotin, Seûdî yekemîn henardekara petrola xav a cîhanê û duyemîn berhemhênera petrolê di asta cîhanê de ye. Henardekirina petrolê, zêdetirî 90 ji sedî asta giştî a henardekariyê li vî welatî û herwisa 40 ji sedî asta giştî a berhemanîna vî welatî lixwe digire.

Bi vî rengî girîngiya petrolê ji bo Seûdiyê xuya dibe û lewma jî Îran hewl dide di serî de asta berhemanîna wan kêm bike da ku pêwîstiya cîhanê bi petrola Îranê zêdetir be û DYA û hevpeymanên vê jî neçar bike givaşên li ser Tehranê kêm bikin.

# Girtiyan tenê maf hebûn bêjin “emir bike qûmûtanê min”



N: Bûbê Eser



Gardiyan

”Me her şikil û metodên lêdanê li ser girtiyan ceribandi bûn. Him ew êdî fêrî lêdanê bû bûn, him jî em ji lêdana weke her roj aciz bû bûn. Ji ber vê yekê bû ku me êdî tiştên çewto mewto dikirin.

Weke piştî meşa derve dema me qawiş dixiste hundir, îcar me yeko yek bangî wan dikir ku ew werin ber derî û komûtê bidin. Di dema komûtdanê de em fêr dibûn ku dengê kê ketiye û yên kê neketiye. Ew kesên ku dengê wan neketi bûn, me ew derdixistin derve û lêdan li wan dikir ku çima dengê wan neketiye. Lê hin mirov hebûn ku ew çiqasî biqêrîyana jî dengê wan nediket in. Kesê weha bêtir lêdan dixwarin û me ji wan re digot:

-Naxwe tu sirûdên muqades naxwînî ha!

-Na komûtanê min na, ji xwe dengê min nakeve, ez çer bikim jî nakeve. Digot.

-De wer li wî biner lo, tew ew min derewçîn jî derdixe, kuro!

Dema me kesekî girtî bi sûcekî sûcdar bikira, heqê girtî tunebû ku ew îtîraz bike. Pêwîst bû ku wî tenê bigota ”tu emir dike komûtanê min” ji bilî vê, gotineke din, sûcê wî girantir û mezintir dikir.

Êdî weha li me gardiyana hatibûn ku em gelekî tiral (tembel) bû bûn, ji ber ku em bi her awayî li ser serê girtiyan azad bûn. Tenê em di warekî de ne azad bûn, bê lêdana girtiyan em nikarîbûn li wê girtîgehê weke gardiyan bimana. Ji bilî vê me çi, çawa bixwesta, li gor dîtin û nerîna yuzbaşî, me dikir. Êdî ji dêlva ku em girtiyan derxin, derve û bi wan meşê bikin, sirûdên leşkerî bi wan bidin xwendin, me di hundir qawişan de, ev tişt, bêyî ku em biwestin, bi wan didan kirin.

Serê sibehan pêwîst bû ku girtî, saet 06.00an rabana ser xwe, rîhên xwe kurbikirina. Bi lez û bez taştêya xwe bixwarina û cixarekêşan jî cixarên xwe kişandibana ku heta saet 07.00a di rêza esasî de, li benda serhejmara serê sibê rawestiyan. Berî serhejmarê, ji alî mesûlê wan de divê ”Sonda Me” dûre di cih de meş û bi dengekî bilind jî sirûdên leşkerî bixwendana.

Dema wan weha dikirin, me jî li kêfa xwe dinerî. Me çi dixwest ew dikir. Car-carna jî me di wan qulikên di şibakên dîwaran de li wan mêze dikir ku bê hela ew her tiştên ku em divên, nîzamî dikin an na.

Pêwîst bû wan bi dengekî gelekî berz sirûd bixwendana. Dema ku wan hemûyan di wî hundirê teng de û bi dengê bilind sirûd dixwendin, zarê guhê gelekan ji ber wî dengê bilnd diteqiyan û gelek bi vê sedemê kerr bû bûn û hinan jî aqilê xwe wenda kiri bûn.
Piştî ku me ev şiklê meş û xwendina sirûdan di hundir de dît, em êdî rehet bû bûn. Serê sibê me emir dida, hetanî xwarina nîvro, piştî xwarinê ev kar dîsa berdewam dibû. Me kar weha bi pêş de biribû ku êdî gelek caran rojên şemî û yekşeman jî me ev tişt dianî serê qawişên cezakirî. Ji ber ku tiştekî rehet bû, tenê me emir dida, kar êdî bi xwe dihate kirin. Berî vê keşifa delal, rojên şemî û yekşema me qet bi wan meş nedikir, lewra me ji xwe re îstirehet dikir...

Me her roj ji girtiyan re bi pereyên wan, rojname û kovar dikirîn ku bi sedema ew wan bixwînin. Di dema dayina wan de, me weha digot: ”Divê yek rojname neyê qetandin, me çawa ev rojname dane we, pêwîst e ku hûn weha li me vegerînin”.

Di vir de mebeste me ew bû; ew rojnameyan nexwînin, ya duda jî dema wan rojname bi awayekî saxlem li me vegerandin, me jî ew li cihê wan vedigerandin. Yanî him rojname dihat girtîgehê, him girtîyan nikarî bûn bixwendana. Him jî me heqê wan, ji girtiyan distend û ji xwe re ew bi şûnde dida û perê wan careke din digirt. Yanî ev rewşeke weha bû ku ji me pêve kesek nikarî bûn, ji nav derketana.

Kesî nikarî bû bigota ku rojname narin girtîgehê, kesî nikarî bû bigota, girtî rojnama naxwînin. Ji ber ku me êvaran dida wan û serê sibê bêî ku yek hatibe qetandin, me bi şûnde digirt û li cihê rojnamafroşan vedigerand. Me heqê wan him ji girtîya distend, him jî ji cihê rojnameyan.

Di nava wan rojnameyan de, me yên seksî jî dikirîn û didan girtiyan. Me wan rojnameyên seksî hema zû bi zû ji wan nedigirt. Me dîxwest rojnameyên weha li girtîgehê hebin. Ji ber ku ew rojnameyên seksî çiqas di qawişan da bimana, ewqasî ehlaqê wan dihat xerabkirin. Bi nerîna sûretên keçikên tazî ehlaqê geleka nebaş dibû.

Bi sozdana ku ew bibin mirovê yuzbaşî, hin soz ji bona kesên weha dihate dayîn. Bi saya serê wan kovar û rojnameyên seksî me gelek kes kirin alîkarê xwe û zilamên yuzbaşî.

## Li Urmiyê xesareke zêde li pey bahozê çê bû

**Di rojên derbasbûyî de di encama barove û babelîskê de li navçeyên Urmiyê gelek dar rastî şikestin û ziyanê hatin. Herwisa pareke zêde ji berhema cotkaran jî, ji nav çû. Ev jî di demekê de ye ku heya niha ti saziyeke dewletê behsa rêjeya ziyanên welatiyan nekiriye.**

Beriya babelîskê, saziya keşnasiyê a rejîmê pêşbîniya çêbûna babelîsk û baroveyê li Urmiyê nekiribû. Eger ew pêşbînî bihata kirin, cotkatan dikarîbûn beşeke zêde ji berhema xwe rakin yan jî rêkarên ji bo parastina berhema îsal bi kar bînin da ku rêjeya xesarê heya astekê kêm bibe.



Di rojên derbasbûyî de tenê li navçeyên Ormiye, Neqede û Şinoyê, lezatiya ba gihabû zêdetirî 60 kîlometran di demjimêrekê de.

Sala 2018 û 2017an jî babelîsk û baroveyê li Urmiyê cotkatr rastî ziyaneke zêde anîbûn lê belê ne saziya bîme û ne jî saziya çandiniyê berpirsyaretî nedane ser xwe û di encamê de ti yek ji cotkaran nehatin qerebûkirin.


## Heqdestê çend mehan ê paremayî ê kedkarên bajarê Seqizê nehatiye valakirin

**Heqdestê kedkarên Şaredarî ên bajarê Seqizê, ku heya niha çend mehên ji ser ve derbas dibe nehatiye valakrin, û ew kedkarene rastî pirsgirêkan hatine.**

Pêka nûçeyên belavbûyî, eve di heyama 3 mehin ku Şaredariya bajarê Seqizê perê kedkaran vala nekiriye û ew jî bûye sedema pirsgirêkeke mizin bo kedkarên wî bajarî.

Piraniaya wan kedkarane dane zanîn ku, me di heyama çend mehên derbasbûyî de pare vernegirtiye û em dax-wazê li berpirsan dikin da ku wê pirsgirêkê çareser bikin.


Herwisa wan kedkarane gotine, hayama destpêkirina



dibistanan û zanîngehan kêm maye, û bi sedema nebûna pare û vala nekirina perê me, em nikarin alavên dibistanan bo zarokên xwe dabîn bikin.

Herwisa wan kedkarên Şaredariyê bi îşarekirin bi pirsgirêkên malî ên wî Saziyê, daxwaz ji berpirsên bajar û nemaze ji parêzgar kirine ku, wê pirsgirêkê çareser bikin, lê berpirsên rejîmê heya niha tu bersivek nedane wan kedkarên şaredariyê.

## Nirxa kincên forim ên dibistanê di bajarê Urmiyê de bilind bû



**Nirxa kincên forim ên dibistanê di bajarê Urmiyê de %80 bilind bûye û eve jî nigeraniya welatiyan li pey xwe hebûye.**

Heyama destpêkirina dibistanê nêzîkbûye, û nirxa kincên forim ên dibistanê di bajarê Urmiyê de %80 bilind bûye, û bilindbûna wan nirxan nigeraniya welatiyan li pey xwe hebûye.

Berpirsê Yekîtiya Kinc û Dirûvanê, Dawud Pûr Elî, di civîna digel Nûçegihaniyek a girêdayî rejîmê daye zanîn ku, ji sala derbasbûyî ve heya niha nirxa têl, derzî û bişkok 3 hember bilind bûne, û eve jî bûye sebeb ku, nirxa kincên forim ên dibistanê jî bilind bin.

Navbirî gotiye: Hewcehiyên destpêkî ên kincan, piraniyan wan li derveyê welatê tê kirin, û kompaniya bo peyda kirina wan hewcehiyane digel pirsgirêkan rûbirû dibin.

Berpirsên rejîmê tenê bi axavtin pirsgirêkan çareser dikin, lê bi kiryar her tiştek wekî xwe dimî ne.

Ji aliyek din jî, nirxa alavên xwandinê di Îranê de pêka sala derbas bûyî, çend hember bilind bûne.

Berpirsên rejîm pirsgirêkan çareser nakin û eve jî dibe sebeba vê yekê ku welatî nekarin bi sedema bilind bûna alavên dibistanê zarokên xwe danîne ber xwindibnê û eve jî arîşeyeke mezine bo civakê.

## Teyrokê xisarek mezin gihande bajarê Urmiyê



**Bi sedem hatina baranek bigur û terok, li deverên Urmiyê û Selamsê, welatiya xisareke bê mînak dîtin û bax û rezên wan rastî xisarên mezin hatine.**


Bi hegera baran û teyrokê, ku zaf deverên Urmiye û Selmasê girtin, li navçên Somaûbiradost, Nazlo, Enzel û derdorên bajarê Selmasê, bi hegera rabûna lehiyê gelek xisarên madî gihîştiye xelkê, bi taybetî xisar li rez û bax û hasila xelkê daye û heta maşînên welatiyan jî ber lehiyê kevtine.

Di wan devaran de, baxên welatiyan bi awayekî gelek xirab rastî teyrokê hatine û xisareke bê mînk gihaye rezên wan.

Ji aliyek din ve jî, lehiyê xisarek mezin gihandiye çandiya welatiyên parêzgeha Urmiyê.

Çotkarên wî parêzgehê di heyama çend salinên derbasbûyî de heya niha, digel qeyrana aborî rûbirû bûne, û ji aliyek din ve jî, digel arîşeyên dabînnekirina xizmetguzariyên çotkarî rûbirû bûne, wê carê jî rastî terok û lehiyê hatine.

## Pirtûka 2x2=1 bi pîtên Latînî û bi zaravayê Kurmancî hate çapkirin




**Romana nivîskarê Bazê Kal a li ser jiyana Qazî Muhammed bi navê 2x2=1 Komara Kurdistanê a Qazî Muhammed' yekem car bi zaravayê Kurmancî hate çapkirin.**

Nivîskarê Kurd ê bi navê "Bazê Kal" romanek li ser jiyana Qazî Muhammed bi navê 2x2=1 Komara Kurdistanê a Qazî Muhammed' yekem car bi zaravayê Kurmancî hate çapkirin, û ev romana li ser jiyan û têkoşîna Qazî Muhammed, 15`ê Îlonê ji aliyê weşanxaneya 'Yöneliş Yayınevi' ve hatiye çapkirin.

Ev romana li ser Qazî Muhammed yekem romane bi zaravayê kurmancî ye ku li Bakûrê Kurdistanê tê çapkirin.
Bazê Kal, nivîskarê pirtûkê, di derheq jiyana Qazî Mihemed de gotiye ku: Min pirtûk bi awayekî romanê nivîsand. Di vê romanê de, min hewl da ku jiyan û tekoşîna Qazî Mihemed bikim bi çîrok.

Nivîskarê kurd "Bazê Kal" amaje bi armanca nivîsandina romana 2x2=1 Komara Kurdistanê anku li ser jiyana Qazî Mihemed daye zanîn ku: Eve yekem care di derheq Qazî Muhamed de ku bi zaravayê kurmancî li Bakûrê Kurdistanê tê nivîsandin.
Lê belê, ev ne pirtûka min a yekem a bi kurdî ye. Min pirtûlka "Ez Xelefîme, Memê Alan û Qela Dim Dimê, ku di derheq jiyana Bedîrxan de ye, nivîsandiye.

## Ciwanekî Kurd di asta Îranê de serkevtin bi dest xist



**Serkevtina ciwanekî Kurd di xwandinê de û bidestveanîna pila 2`emîn di Îranê de.**

Xwandkarê Kurd yê bi navê "Wehîd Îsaszadeyê Qurmîk" kurê Birahîm û xelkê bajêroka Melhemê ya ser bi Bajarê Selmasê, di karnasiya erşed li rişta RS û GPS ya nexşê cografiya yê de, di seranserê Îranê de pila 2`emîn bidestveanî.
Ew Xwandkarê rişta "RS û GPS" ya Cografiyayê di zanîngeha Tehranê de, karî pila 2 li Astê Îranê û Midala Zîv li Olempiyaya Zanistî ya Xwandkarên Îranê bidest bîne.

Herwisa wî Xwandikarê Kurd karî di nava hemû zanîngehên parêzgeha Urmiyê de jî, pila yekim a Zanista Erdnasiyê bidest bîne.

## Endamekî Hizba Demokrat di kêbirkê ya werzişî de, pileya yekem bi dest anî



**Endameke Hizba Demokrat li kêberkêya fidrasiyona nawneteweyî ya KUBO li werzişên rezmî de, pila yêkê bi dest xist.**

Saziya Cîhanî ya Werzişên rezmî ku kêberkêyek li Bajarê Dihokê bi rêwe bir, endameke hizba democrat jî ku werzişwanê ware rezmî daye, beşdarî wê kêberkêyê bû.

Li encama kêberkêyan de lawê werzişvan Emîr Pûya karî li werzişa rezmî de pila yêkime wê fidrasiyona cîhaniye werzişê bidest bîne.

Li dema dana xelat bi wî lawê serkevtî, şandeke hizba demokrat pêk hatî ji Nuneratî û kumîta Hizbê li Soran bi serperestiya Ramîn Omerzade Nunerê Hizbê li Soran li merasima xelat danê de beşdar bû .

Her bi bona serkevtina Emîr Pûya li wê kêberkêyê de, nuneratiya Hizbê li Soran jî Xelatê rêzlênanê pêşkêş wî kir.

Fidrasiyona Werzişiya KU BO li 53 welatên Cihanê deî, çalakî û kêberkêyên Werzişî bi rêwe dibe.

### Werzişwanekî Kurd berdewam serkevtinan bi dest tine




**Tevî wan arîşe û pirsgirêkan ku ji aliyê rejîma Îranê û Fîdrasiyonên werzişî ve bo werzişwanên Kurd dête pêş, werzişwanên Kurd berdewam di warên curbicur de serkeftinê bi dest tînin.**

Werzişwanekî Kurd ê Yarsanî, bi bidestveanîna pileyê di sebka kêş di werzişa wezinberdarî de karî medala zîv bi dest biîne, tilisma 4 deheka bi dest anîna vê medaliyayê ji aliyê Îranê ve bişkîne.

"Hafiz Qeşqayî" wezinberdarê Kurd, li desteya 55 kîlo di qehremaniya cîhanî de, karî midala zîva du zerbî a cîhanî bi dest bîne, di warê wê werzişê de bo xwe misoger kir.

Herwiha "Pûpek Besamî" Keçe werzişwanek ya Kurd ya xelkê parêzgeha Kirmaşanê jî, roja 28`ê Xermananê di girûpa dî desteya 55 kîlo di kêbirkêya qehremanî ya temen mezinan de li welatê Tayîlendê, karî rîkorda Îranê yek kilo zêdetir bike û bi giştî bi şikandina du rîkord, ew kêbirkêyê dawî pê bîne.

"Pûpek Besamî" yekemîn jin wezneberdar ya Îranê tê hesibandin ku di kêbirkêyên cîhanî de beşdarî kir û çend weznên bi kêşên "64, 69, 72" kilo bilind kir.

# Zimanê Kurdî

(Ji) :

- Min ji vî (hevalî) re got
( Min ji vî re got ) .
( Min jê re got )

- Te çi ji vê (hevalê) standiye ?
( Te çi ji vê standiye ?)
( Te çi jê standiye ? )

- Nêrgiz ji wî (gundî) hat (Nêrgiz ji wî hat) . (Nêrgiz jê hat ) .

- Azad ji wê (gulistanê) hat (Azad ji wê hat) . (Azad jê hat ) .

- (Li) :

- Ez li vî (gundî) bûm
( Ez li vî bûm) ( Ez lê bûm ) .

- Te li vê keçê dipirsî ?

(Te li vê pirsî ?)
(Te lê pirsî ? ) .

- Nêrgiz çi ji wî hevalî dixwaze ?

(Nêrgiz çi ji wî dixwaze ?)
(Nêrgiz çi jê dixwaze ?).

- Nêrgiz li wê hevalê pirsîbû

(Nêrgiz li wê pirsîbû)
(Nêrgiz lê pirsîbû ) .

- (Bi) :

- Ez bi vî hevalî re hatim .
( Ez bi vî re hatim) ( Ez pê re hatim) .

- Zîn bi vê pênûsê dinivîse
( Zîn bi vê dinivîse) ( Zîn pê dinivîse) .

- Ez bi wî hevalî re hatim
( Ez bi wî re hatim ) ( Ez pê re hatim)

- Zînê bi wê pênûsê nivîsiye
( Zînê bi wê nivîsiye) (Zînê pê nivîsiye).

- (Di) :

- Çi di vî xaniyî de heye ?
(Çi di vî de heye ?) (Çi tê de heye ?).

- Kî di vê malê de ye ?
(Kî di vê de ye ?)
(Kî tê de ye ?) .

- Pezê me di wî xaniyî de ye ( Pezê me di wî de ye ) ( Pezê me tê de ye) .

- Hevalê min di wê malê de ye ( Hevalê min di wê de ye) ( Hevalê min tê de ye) .

Wekî ku di van mînakên jorîn de diyar dibe, dema ku ev cînavên nîşandan (vî,vê, wî, wê) li pey van pêrbestan (ji, li, bi, di) bikar tên, ew cînav û pêrbest dibin : (jê, lê, pê, tê) û navên nîşandayî (nîşankirî), yên li pey cînavan tên avêtin . Wek :

- Ez bi vê pênûsê dinivîsim .
(Ez pê ...dinivîsim) .

Dema ku cînavên nîşandan bi karan re jî têne kurtkirin, navên wan ên nîşankirî jî, têne avêtin . Wek :

- Te pênûsek da vî hevalî
( Te pênûsek dayê...).

- Te pênûsek da vê hevalê
( Te pênûsek dayê...) .

- Min av xist vî kûzî
( Min av xistê...).

- Min av berda vê zerikê
( Min av berdayê....).

b- (pêrbest + cînavên kesîn ) : Ev her dû cînavên kesîn (wî, wê) jî bi wan pêrbestan re têne kurtkirin û pevxistin :

- (Ji) :

- Te çi ji birayê xwe re got ?
( Te çi ji wî re got ? ) ( Te çi jê re got ?).

- Te çi ji xuşka xwe re got ?

**Dom heye...**

# Agirî

Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (358)


## Wêneyên dewra 238 ya destpêkî ya Hêza Pêşmergê Kurdistanê









